


Mahmut Baksı
Wêne: Durali Bozkır

Zarokên İhsan



Rabén & Sjögren

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

Mahmut Baksı

Wêne: Durali Bozkır

ZAROKÊN İHSAN

Institut kurde de Paris

INSTITUT KURDE DE PARIS

Bibliothèque

Reçu le 28.10.2021.....

LIV.7708



Rabén & Sjögren

Institut kurde de Paris

KF Rabén & Sjögren, Stockholm

© Text: Mahmut Baksî, 1978
Ill.: Duralî Bozkiş, 1977

Printed in Denmark 1978

ISBN 91 29 51899 7

The Swedish edition of the book (Ihsans barn) was
published in 1977

PÊŞGOTIN

Ev pirtoka siftê, bi swedî hate çapkirin. Armanca min ewbû ku, bi reya vê pirtokê li Swêd Kurdistan bidim naskirin. Îro bi hezaran zarokên Swedî vê pirtokê dixwinin û jiyana Kurdan hin dibin.

Li Swêd du hezar Kurd hene. Piraniya wan bi zimanê swedî nizanin. Jiber wê yekê min xwest ku ev pirtoka bi zimanê me ji were çapkirin. Jiber ku li Swêd her kes bi zimanê xwe xwendinê dikên. Di dibistanên Swêd de dersxanên me ên kurdî hene. Bi sedan zarokên me diçin wan dibistanan û bi zimanê xwe dixwinin. Lê bi kurdî pirtokêmin. Daxwaza min ew e ku, zaneyên Kurd vê valehiyê tiji bikin û jibo zarokên Kurd binivisin.

Min sê pirtok jibo zarokên me nivisin. Payîza bê "ZOZAN" ê çap bibe.

"Zarokên Îhsan" bi swedî, kurdî, danimarkî û norweçî hatiye çapkirin. "Zozan û Welat" jî ê bi van zimanan werin çapkirin.

Mahmut Baksı

Avdar – 1978
Stockholm

Institut kurde de Paris

Ez vê pirtoka xwe ji diya xwe re
diyarî dikim, ku ev zimanê xweş daye min.


Mahmut Baksı

Institut kurde de Paris

WELAT

Welat beriya çar mehan hat
Swêd. Berê li bajerekî
Kurdistanê dima, navê wî
Farqîn bû. Welat bi dirêjiya
salan bavê xwe Îhsan nedîti bû.
Bavê wî li Swêd dijî. Jiber vê
yekê Welat bîra bavê xwe pir
kiribû û çavê wî her roj li reya

naman bû. Carna rûyê bavê
xwe jibir dikir. Lê rojekê diya
Welat bi zarokên xwe ve bi
balafirê firiya Swêd. Gundê
Welat, xaniyên kerpiçî û reyên
bi celb, cih bi xaniyên mezin,
bilind û beton ve guhartin.



— Tu çend salî yî Welat?

— Heşt.

— Çima tu hatî Swêd?

— Swêd çi ye?

— Ev gundê nû?

— Haaa! Yanê Şempinge?

(Navê herema — Mehela — Welat Şempinge ye û perçekî Stockholme.) Bavê min li vir dijî ez jî hatim.

— Çima bavê te li vir dijî Welat?

— Jiber ku li Farqînê bavê min neçar û betal bû. Bavê min her roj li mal dima. Carna ku perên wî çêdibûn, diçû qehwexanan.

— Çima perê bavê te tunebû?

— Bavê min ne dixebitî; bo ku kar tunebû.

— We doliwa xwe bi çi dikir?

— Bi şorba nîskan, bi nan û dew, bi pîvaz û mast. Carna jî ku yek jin dihanî, me goşt û sawar dixwar. Goşt û sawar çiqas xweş bû!

— Li vir jî bavê te her roj li male?

— Na. Bavê min li vir firaqan dişo.

— Fraqên kê?

— Ên biyaniyan. Ji bo mêran li Farqînê firaq şûştin pir şerm bû. Lê ne li vir. Kesek li vir



bavê min nasnake. Û gava bavê min firaqa dişo, bi elban peran didinê. Perên bavê min haa di vê sandoqê denin. Û bavê min her roj ji me re; goşt, masî, fêkî dikire. Û diya min jî wan diqelîne, û dipijîne. Û ez dixwim, dixwim ta zik ji min mezin dibe, dipife, diwerime. Carna ji min ku ê zikê min biteqe. Lê zik ji biteqe, ezê dîsa bixwim. Goştê qelandî wusa xweş e, wusa xweş e, ji min be ku ez di xewa xwe de jî bixwim.

— Ê tu yêji firaqan bişoy Welat, gava tu mezin bibi?

— Bavê min got, li vi gundî tu di navbera firaqsoyan û mihendizan de firq tune. Her du jî wek hev peran distînin.

— Tu çawa hatî vi gundî Welat?

— Ez bi balafirê (teyare) hatim.

— Te berê qet balafir ditibû?

— Erê.

— Li kuderê?

— Li ezmanê Farqinê.

— Gava ku hûn firiyan, tu netirsiyayî?

— Nayê bîra min. Balafirê em xistin zikê xwe û firiya. Ta

min çavên xwe vekirin, ha min dît ku em dîsa li erdêne. (Diya Welat ji min re got; Welat ji tirsê di balafirê de raza bu.

Tiştêk nayê bîra wî.)

— Hûn paşê hatin kederê?

— Em hatin ber xanîkî mezin û bilind. Xanî belkî ji xaniyê Uso Axa deh caran mezintir bû. Siftê ji min ku otel e. Lê bavê min got, "Na kurê min ev ne otele, ev xaniyê me yê nû ye." Û paşê bavê min em xistin qutikê hesinî, (esansör). Ev qutîya hesinî bilind, bû, bilind bû. . çû û çû bi jor ve. Min ji bavê xwe re got, "Bavo ma em dîsa ketine balafirê?" Bû teqa teqa bavê min, kenîya û got, "Na kurê min, em diçin mala xwe ya nû."

Paşê min ji vê qutîya hesinî pir hezkir. Rojê belkî deh caran ez pê diçûm jêr û jor.

— Te çawa zanibû ku mala we li kîja qatî ye?

— Bavê min bişkovêk bi şûjinê qul kiribû. Jiber ku diya min nizane binivîse û bixwîne.

— Tu dîsa her roj deh caran bi wî hesinî diçî û tîyî?

— Na, ne hewqas. Ez êdî jê têr bûme. Bavê min bavekê pir



baş e. Kefa min jê re zahf tê. Ew jî min re her tiştî dikire. Ez her roj li pisiqlêta xwe siwar dibim û digerim. Li Farqînê tenê pisiqlêta kurê Uso axa hebû. Wî me qet lê siwar nedikirin. Min ji diya xwe re di got, "Dadê çima pisiqlêta kurê

Uso Axa heye, a min tune?" Diya min digot, "Bavê te ne axa ye Welat. Bitenê kurên axa dikarin li wan siwar bibin; ne zarokên şivanan û cotkaran."

— Li vir pisiqleta te heye. Ma bavê te bû ye axayê vî gundî?

— Bavê min got li vi gundî, hikumet pera dide dad û bavan, ku ji zarokên xwe re tiştan bikin. Li vi gundî zarokên bê pisiqlet tune.

Rojekê ez û bavê xwe li nav dahlê digeriyan. Di nav wan dar û beranda bi sedî pisiqletên kevn hebûn. Zarokên vî gundî ên xwe yê kevn davêjin û ji xwe re ê nû dikirin. Min ji bavê xwe re got, "Bavo, ez dixwazim çend hep ji vana bişînim Farqînê, ji hevalên xwe re. Bavê min nehişt. Lê ezê rojekê bi tenê herim wir, bi dizî û çend hep ji wana bişînim Farqînê. Nemaze ji hevalê Heso re. Heso lawikekî pir baş û dilsoz bû. Rojekê Heso destê xwe da pisiqleta kurê Uso Axa. Kurê axê çend kulm li devê Heso xistin. Kurê axê ji Heso mezintir û xurtirbû. Jiber ku kurê axê her roj goşt û fêkî

dixwar. Hessoyê reben jî nan
û dew. Jiber vê yekê Heso ji
erdê kevirek rakir û avêt nava
çavê pisiqleta kurê axê; çavê
pisiqletê rijiya erdê, bû
arvan . . . Paşê polisên Tirkan
hatin û Heso dan ber copên
xwe. Wusa lê xistin, ku heta
xwîn ji dev û pozê wî rijiya.

— Tu li vi gundî hezdikî an li
Farqînê?

— Li vi gundî.

— Çima?

— Jiber ku li vir pisiqleta
min heye. Bavê min ji min re
tiştên listikê kiriye. Û bavê min,
gava ez mezin bibim weki mêra
ê ji min re tomefilekê ji bikire.
Û dibistana (mektep) vir her
tişt belaş dide min: nan, pirtok,
defter, pênûs (qelem). Li
Farqînê ev tev de bi peran bûn.
Bê pera min nikaribû herim
dibistanê. Mamosteyê me yî
Tirk her roj li min dixist;
gotinên pîs dikir.

— Tu li vir qet teng nabî
Welat?

— Gava ku ez nû hatibûm,
vi rê gelekî li xweşî min dihat.
Lê vê dawiyê ez pir dilteng
dibim. Carna ji min ku ezê dîn
bibim.

— Te go çî?

— Wan mehên pêşî ez li
pisiqleta xwe siwar dibûm û
digeriyam. Lê vêgavê ez jê
têrbûme. Çavê min li havalên
min ên Farqînê digere. Ez her
şev wana di xevna xwe de
dibînim û digrim. Carna qijînî
ji min tê. Diya min şiyar dibe
û avê dide min. Ez xewnê xwe
de bi wan re çavberdokê
dilîzim, em diçin ber pez û
dîloka dibêjin.

Lê bavê min got, sala bê ê
mala hevalê min Heso jî were vî
gundî. Wê çaxê ezê dîsa dilxweş
bibim û êdî wan xewnên pîs
nabinim. Dîsa bavê min got,
havînê emê herin iznê û dû
mehan li Farqînê bimînin. Ku
em çûn ezê kevnê xwe bidim
hevalan. Ezê pera jî bidim wan.
Ezê wana belaş li pisiqleta xwe
sivarkim. Bila her roj ber devê
deriyê Uso Axa re herin werin,
êdî bila kurê axa biteqe,
bifetise . . .

— Hevalên te li vir hene
Welat?

— Ev zarokên porzer li min
dixin. Laşê min diquncirînin,
derziya dixin destê min. Duhi
min yek ji wan bi tenê girt û

da ber kulma, da ber pêhna.
Min wi li erdê gevizand,
kirasê wî qelaşt. Ez carna ji
bavê xwe re dibêjim,” Bavo, ev
zarokên porzer û çav şîn li min
dixin, porê min dikişînin, bi
min re nalîzin. Lê bavê min
qet dengê xwe dernaxe û bi wan
re naxeyîde. Li Farqînê ku
yekî li min bixista, bavê min jî
li wi dixist.

— Zarokên porzer, ji te re çi
dibejin?

— Ji min re dibêjin, Tirkê
pis û çepel.

— Ma tu Tirkî Welat?

— Zarokên vêderê ji hemû
porreşan re dibêjin Tirk. Ji wan
ku, ki porreş e ew Tirk e.

— Gava zarok li te dixin,
hûn giliya wan nakin?

— Emê ji kê re gilîkin? Li
vir cendermên Tirka tunene.

— Tu qet bi wan zarokên
porzerre nalizî?

— Di dersxana min de porzer
tunene.

— Lê ki hene?

— Em tev porreşin.

— Jiku hatine evên porreş?

— Ji bajêrekî feqir û
xirabe. (Şile)

— Tu bi zimanê wan dizanî?

— Na, nizamim. Em bi dest û
çavan bi hev re xeber didin. Ji
bo lîstikê ziman ne pêwîste. Em
qîjîn dikin, herkes bi zimanê
xwe çi tê devê wan dibêjin û
yariya dikin.

— Tu, ji mamosteyê xwe hez
dikî?

— Mamosteyê min pir pîs e,
qet nebaş e. Car carna porê
min dikişîne û çavê xwe ji min
re sor dike. Carna mîza min tê,
min divê biçim avdestxanê. Ez
bi zimanê mamoste nizamim. Ji
bo vê, ez radibim û diçim. Wê
gavê mamoste tê û li min dixê.
Min ji bavê xwe re got. ”Bavo,
mamoste her roj li min dixê,
tadeyî dide min. Ez vê jinikê
naxwazim.” Lê bavê min ji min
re dibêje. ”Welat te çi zû jibîr
kir; mamosteyê Tirk li Farqînê
her roj bi daran û bi şimaqan li
te dixist, serê te dişikand. Dîsa
jî me nikaribû dengê xwe
derxista.”

— Ma, mamosteyên Kurd
tune?

— Belê hene, lê her roj nayên.

— Mamoste, gava ez bêjim
kefa min ji vi gundî re nayê,
ma ê me ji vir bavêjin?

— Kê ji te re got?

— Bavê min ji me re got ku, kê ji we pîrskir, hûnê bibêjin kefa me ji vî gundî re pîr tê. Nexwe ê me ji vir bavêjin; malê me, perên me, tiştên me ji me bistînin. Emê dîsa feqîr û belengaz bibin wek li Farqînê.

— Yanê tu dixwazî bêjî ku kefa te ji vî gundî re nayî?

— Sond bixwe ku tu ji kesi re nabêjî?

— Erê, ez sond dixwim û soz didim.

— Bi rastî ez naxwazim li vî gundî bijîm. Li vir hîç hevalên min tunene. Zarokên porzer li

min dixin. Ez nikarim herim mala cîranan. Herkes deriyê xwe li hev digire. Kes bi zimanê min nizane. Min bavê xwe re got, "Bavo, ez dixwazim pisiqleta xwe bigrim û herim Farqînê." Lê bavê min got, "ne vê gavê kurê min. Piştî me gelek pere gîhande hev, dewlemend bûn, tomedil û xanîyek stand, wê gavê emê bikarin biçin.

— Bavê te qet li diya te dixê?

— Carna. Lê ne wek li

Farqînê.

— Li te jî dixin?



— Diya min carna li min dixe. Nemaze gava ku ez ji bavê xwe pere dixwazim. Wê gavê diya min ditirse û min dide ber şimaqan. Jiber ku li Farqînê gava min pere ji bavê xwe dixwest, bavê min pir dêşiya û li diya min dixist. Bo ku perê wî tunebû.

— Lê te got, li vir perê bavê min hene.

— Erê, li vir pere pir in. Lê diya min fêhm nake. Diya min hêj carna xwe li Farqînê dizane. Gava ku ez ji bavê xwe pere dixwazim, ji wê ku dîsa bavê min ê lêxe.

— Gava diya te li te dixe, tu çi dikî?

— Ez jî li xwûşka xwe Bêrîvan dixim.

— Bêrîvan li kê dixe?

— Ew jî bi kulma li erdê dixe.

ZOZAN

Zozan havîna çûyî ket sala yanzda. Berî çar mehan bi birayê xwe Welat re hat Swêd. Ger Zozan nehata Swêd dibû ku piştî sê salên din bibûya bûk û zarokê wê ê li ser milê wê bûya. Lê li Swêd mirov bi çavekî piçûk li panzde -şanzde saliya dinêre.

— Tu çawayî Xwûşka Zozan?


— Ez jibo diya xwe pir dêşim, Mamoste.

— Jibo diya xwe?

— Diya min dibêji ka dîn bûye. Pir bi hêrs bûye. Her roj bê ûşt girî. Xasma di van rojên dawî de bi zikê xwe digre û dinale. Deste wê yê çep her gav li ser teniştê wê ye. Lê bavê min qet halê diya min fêhm nake. Bavê min dibêje, xweşî û ronahî diya me xistiye vê rewşê. Her tiştên wê heye, dîsa pê qîma nahêne û bela xwe bi me dide. Ez nîzanim diya we li min doza çi dike.

— Diya te çima wusa bûye Zozan?

— Diya min li vir pir tenê ye.




Li Farqînê bi seda hevalên wê hebûn. Diya min her gav ji bavê min re dibêje, "Xwezî ez dîsa feqîr, belangaz, birçî bûma; Lê ez ji ciranên xwe neqetiyama. Ew ciranên me yên dilsoz û şîrîn." Diya min her roj diçû mala wan û bi zimanê xwe dipeyîviya; dikeniya, çîrok digot. Lê li vir tu cîran bi zimanê diya min nizane.

— Li vir nasên we hene?

— Maleke Kurd heye. Lê ji me pir dûr in. Diya min carna diçe mala wan û bîna xwe derdixe. Lêbelê wexta wan pir tune ye. Ew bi şev û roj kar dîkin. Em ji bi roj diçin dibistanê. Wê gavê diya min bi Berîvan û Zinar re tenê dimîne. Diya min bi serê xwe ditirse here bigere. Diya min

cahil e û nikare bixwîne. Bi wê ku biçê derve ê hunda bibe û dibêjî. Bajarê me pir mezin e. Gelek carna diya min ji bavê min re dibêje," Ez dixwazim ku bi zarokên xwe re vegerim Farqînê. Ez li vir naqedinim, ezê di dangiyê de din bibim." Lê bevê min qebl nake û dibêje. "Ez zarokên xwe nadim. Ku tu dixwazî biçî, fermo biçê. Ez nikarim li vi welatî bê zarokên xwe bijîm. Jiyana bê zarok ne tu jiyane.

— Tu çewanî Zozan?
 — Bi diya min ku em tev dîn bûne. Em ji dibêjin diya me dîn bûye. Dibe ku em tev bi hev re dîn bûne. Bi kurtî, revşa li vir ne tu rewşe. Xwezî em ji Farqînê nehatibûna. Bavê min ji me re rastî negot. Di namên xwe de dinivîsî û digot, "Vir wekî bihuştê ye (cinet). Li vir bîna mirov qet teng nabe." Lê ne rast e. Ez carna dikim ku bîteqim.





— Li vir hevalên te hene Zozan?

— Ez li vir bê heval im. Zarokên biyanî her roj li hev dixin, serên hev dişkênin. Zarokên Swêd ji ji me hez nakin. Ezê bi kê re bidim û bistînim?

— Yanê tu naxwazî li vir bijî Zozan?

— Belê, naxwazim. Lê ji destê min tiştek nayê Mamoste.

Her tişt li gor dilê mirov çênabe.

— Qet hevalên te yên Swedî tunene?

— Çend hep hene.

— Kî ne?

— Serxweşên wan. Evên ku ji sibê ta êvarê arak vedixwin. Berê ez ji wan pir ditirsiyam. Gava ku ez di ber wan re derbaz dibûm, kenê xwe bi min dikirin û serên xwe ji min

re dihejandin. Min ji bavê xwe re got. "Bavo, ev serxweşên han ji min nagerin, bela xwe bi min didin." Lê bavê min bi min keniya û got, "Metirse ji wan keça min. Ew mirovên pir baş in û bê zerar in. Ew ne weka serxweşên me ne." Ez vêga heq didim bavê xwe. Kefa min ji wan re pir tê. Jiber ku, ji wan bêtir kesek bi min re napeyîve. Xwezî xelkên Swêd tev serxwos bûna. Wê gavê minê bikaribû bi gişan re bida û bistanda.

— Li Farqînê dewarên we hebûn Zozan?

— Pir hebûn Mamoste. Mî, bizin, çêlek, ker û conega. Mirîşk û dikên me jî hebûn.

— Te ji wan hez dikir Zozan?

— Xwezi vêga ew jî li vir bûna. Wê gavê qet bîna min û ê diya min teng nedibû. Lê bavê min berî ku ê bê vir tevde firot. Bavê min dibêje, gava em pezê xwe bînin vir û pez li riya rêx bikin, ê an me ji vir derxin, an jî, ê me bixine hepsê. Madem wusa ye, çima hikumeta vir xwediyên kûçikan naxe hepsê. Kûçikên vira her roj li ser riya bi tonan gû dikin. Lê

bavê min dibêje, pez û kûçik ne wekê hev in. Xelkên vira bê kûçikan nikarin bijîn.

— Kefa te ji kûçikan re nayê Zozan?

— Na wele nayê. Zarokên vir kûçikên xwe berdidin min. Kezeba min ji wan diqete. Carekê yek ji wan kûçikan bi fistanê min girt. Ez hindik mabûm ji xwe biçûma. Û a pîstir li vi bajarî kevir tunin ku mirov bavêje wan. Li Farqînê li ser rêyan bi hezeran kevir hebûn. Lê bavê min got, ku mirov keviran bavêje kûçikên Swêdiyan, ê me tawanbar (ceza) bikin.


— Kûçikên vir nerm in Zozan.

— Te got çî? Kûçikên nerm jî hene Mamoste? Ez qet bawer nakim. Li Farqînê kûçikekê me hebû, navê wî Reşo bû. Pir dijwar bû. Her roj xelk gez dikir. Ji bo wî bavê min û ciranên li hev dixistin û bihev diçûn. Ciranên navê wî danîbûn cenderme. Ew jî weke cendermên Tirkan har bu.

Li vir ji kûçikên xwe pir hez dikin. Wek zarokan wan didin bin çenge xwe û wana maçî

dikin. Doh cirana me goştê
pijandî da kûçikê xwe; kûçik
nîvi xwar, nîvi ji wê xwar. Ez
pera pera wereşiyam. Min ji
diya xwe re got, diya min jî
wereşiya. Li ba wan paqijî
tuneye Mamoste.





– Li Farqînê te qet Wêneguhêz (televizyon) dîtibû Zozan?

– Erê, min dîtibû.

– Wêneguhêza we hebû?

– Na, tunebû. Wêneguhêz pir bihaye. Feqîr û gundî nikarin bikirin. Min

Wêneguhêzê li mala zabitên Tirkan di. Ez û hevalên xwe bi şev, bi dizî diçûn piştî mala wan zabitan û me di pincerê re lê dinerî. Zabit carna cendirmê xwe dişand û em didan ber kulman.



SEBRO

Li Kurdistana Tirkîyê nêzikî
sih hezar File (Sûryani) hene.
Ew jî weke Kurdan li gundan
dijîn û bindest in. Piriniya wan
bi zimanê me dipeyivin û
piriniya wan xwe Kurd dizanin.

Hikumeta Tirkan pir tadeyî
dide wan. Beriya pênce salî
Tirkan bised hezaran ji wan
kuştine, wana talan kirin û
şandin nefiyê. Ew zînat û

zoredarî ta îro dom dike.
Hikumeta Tirkan bi zaneyî
Kurdan û wan berdide hev, ji
bo ku bi keviyekî li du çivikan
bide. Cendirmên Tirkan
davêjin ser gundên wan, û
eziyetê li wan dikin. Jiber ku
Tirk naxwazin ku ev gelana
şiyar bibin, bi Kurdan re bibin
yek û mafên xwe bistînin.

Ji bo vî, piraniya wan,

gundên xwe, malen xwe, milkên xwe berdidin û tekeser cihanê dibin.

Sebro jî yek ji Wan e. Bav û diya Sebro, ji ber zînata Tirkan reviyane û hatine Swêd. Îro li Swêd şeş hezar file hene û hê jî tên.

Ez rojekê çûm mala Sebro. Diya wî ji me ra goşt û sawar çekir, dewekî xweş dani ber me. Bavê Sebro ji hikumeta Tirkan pir bi dert bû. Lê Sebro ne dihişt ku bavê wî bi min re bipeyive. Sebro gēj bûbû li vî welatê biganî. Sebro dixwest ku di nava bîstekê de her tiştî hin bibe. Pirsên Sebro dawî nedihatîn.

- Navê vî gundî çi ye bavo?
- Stockholm e.
- Axa ki ye?
- Axa li vî gundî tune Sebro.
- Gundên bê axa jî hene bavo?
- Erê, kure min.
- Gundê me yê kevn li kuderê ma?
- Li dûr ma.
- Kê ew bi dûr xist.
- Hikumeta Tirkan.
- Çibû bi ker û kûçikên me?
- Ew li gund man.

— Nikarin em wan jî binin vira?

— Na Sebro, gund pir dûr e.

— Em dikarin wan jî têxin balafirê bavo?

— Nabe, kurê min.

— Li vî gundî çima mirîşk, dîk, bizin tune bavo?

— Hene lawo.

— Li kû ne?

— Li firoşgahan.

— Zarokên vir çima lal in bavo?

— Zarokên vir ne lal in

Sebro. Bi zimanê xwe dipeyîvin.

— Ji kurdî bêtir jî ziman hene?

— Erê kurê min, bi sedan ziman hene.

— Xaniyê me kê çekir bavo?

— Dewletê.

— Dewlet kî ye?

— Dewlet akakî mezin e. Lê mirov bi çava wî nabîne.

— Çima xwe vedişêre?

— Nizanim.

— Ew jî wek axê gundê me har e?

— Ew ne hewqas har e Sebro. Lê ew jî axa ye, jibîr meke.

— Gava ku baran bê, ê xaniyê me dilop bike?

— Dilopên çi?



— Çima li gund dilopên me dihatin?

— Xaniyê me kerpiç bû, baniyê me ax bû.

— Li vî gundi ji mar, dûpişk, kermêş hene?

— Na.

— Çune kuderê?

— Ew li gundê me yê kevn man.

— Ez ditirsim ku ew jî îro sibê bêne vir bavo.

— Nikarin Sebro. Perên wan ên bilêta tune.

— Tu çawa qaz yaxi dixi lamba me?

— Qaz yaxiya çi kuro?

— Lê çawa vêdikeve?

— Bi bişkovkê.

— Ku ez pif bikimê, ê bivemre?

— Tu pir pirsan diki lo , te serên me gêj kir.

— Emê kingê herin cot bavo?

— Cotê çi? Li vir cot tune.

— Li vir jî misliman hene bavo?

— Erê, hene.

— Li vir jî ê li me xin?

— Na, nikarin.

— Li gund çima li me dixistin?

— Axa ji wan re digot.

— Ku axayê vir ji bibêje?

— Axayê vir file ye kurê min.

— Bavo, ji axayê me ra bêje bila li misilmana xe.

— Na lawê min. Em tev heval û pismamên he vin. Em divê bibin yek û li dijî axan û hikumeta Tirkan bixebitin.

Sebro fikir nedikir ev gundê

han, ev jiyana nû, nediket serê
wî. Reben li vî bajarê mezin gêj
bûbû. Çima zarokên vir porzer
bûn? Hevalên wî yê zarokî li ku
ma bûn? Çima ew na jî ne li
vir bûn?

Sebro neh salî bû. Ê pir dem
bigre ta ku Sebro zanibe çi
hatiye serê wan. Wê gavê ê
Sebro dagere Kurdistanê û ê
ciyê xwe bigre; bi zarokên
Kurdan re bibe yek.



MEMO

Memo Kurd e û ji bajarê Kulu'ye. Tirkan van Kurdên mêr û dilsoz nefî kirine û ewna ji Kurdistanê dûr xistine. Lê zimanê wan, tevgerên wan wek xwe maye û di nav Tirkanda wenda nebûne. Îro li Swêd bi hezaran ji van Kurdên xas, welatparêz hene.

Memo jî yek ji wan e. Berî deh salan hatiye vir, bi dê û bavê xwera. Memo heyjde salî ye û li aşxanekê kar dike.

— Xelkên me çima tên Swêd Memo?

— Em feqîr û bêkarin kek. Li bajarê me kargeh, şixulxanê tune. Hikumeta Tirkan ji mera ne baş e û zînatê li me dike.

— Jiyana vir gelek zor e Memo.

— Belê, zor e. Bi rastî jiyana me livir ne tu jiyane. Jiyan ne tenê pere civandin e. Rast e, li vir xaniyê me, tamefila me, hasili her tiştên me hene. Lê dîsa jî welat şîrîn e, welat delal e; bê wê nabe. Swêd bi kêmanî du sed sal pêşiya me da ye. Ez

dikim û nakim nikarim bibim weke wan. Ew jî ne tişteki xweşe. Jiber ku tu dan û sitandina me bi wan re çênabe. Em weke ku di girtîgehêde bin. Ne zimanê me tenê belaya me ye, porê me yê reş jî dibe bela û dikeve ber piyên me. Herkes bi çaveki nebaş li me dinerin, an ji me piçûk dibinin.

— Li Tirkîyê rewşa we çawabû Memo?

— Ne tu rewş bu kek. Ku perên mirov hebûya başbû. Lê bê pere û bê pişt jiyan dibu wek zindan. Hikumet tu alîkarî nedikir û bi destê feqîran nedigirt.

Li gundê me elektrîk, rê, ava paqij tune. Gava dibe şev gund tarî dibe û zarok newerin herin derva bigerin. Poxanên gund tijî dupişk û mar in. Salê bi dehan zarok dimrin. Tixtor, derman, nexweşxane, em tenê navê wan dibihîzin. Nexweşên me zû bi zû sax nabin. Xelkên me zû pîr dibin û dimrin. Xwarina me şorbe, wexwarina

me dew e. Pêwestiya me kamçur dane. Hasili em bûne kolên wan. Ew dixwazin ku ev koledarî, ev perîşanî, ev rebenî dom bike û her bimîne.

— Li gundê we dewlemend hene Memo?

— Ciyên feqîr hebin ê dewlemend jî hebin. Ev her du tişt bi hev re girêdayîne. Lê feqîr pir in, dewlemend hindik; feqîr sito xwar in, dewlemend qelew. Hikumet bi axan û

dewlemendara ye. Axên me pişt a xwe dane dijminên Kurdan û bi wan ra bûne yek. Destên hikumetê di qirika me daye, ê axan di berîka me de. Yek li me dixê, ê din me dişelîne; yek me birçî dihêle, ê di tazi.

— Zaroktiya te çawa bû Memo?

— Dibejin ku zarokî pir xweş e. Pir merov hene dixwazin ku dîsa bibin zarok û





bilizin, bazdin, bigrîn, bikenin.
Dibêjin ku, gava mirov zaro ye,
tu berpîrsiyariya mirov tune ye.

Lê hûn werin zarokiya min ji
min bipîrsin. Ez dizanim ku
min çi zarokayî derbaz kiriye.

Gundê me pênçe xane ye.
Xaniyên me kelpîç in, reyên
me celb û herî. Heya ez heşt
salî bûm jî, zikê min pîfiya bû,
çavên min dêşîyan, gohên
min werimî bûn. Salê dibû ku
carekê an jî du caran min rûyê
goşt didît. Bavê min, diya

min, mezina; hasilî kî dihat li
min dixist, an jî ez didam ber
şimaqan. Sala ku baran
neketa, sal ku genim ne baş bû
dîsa lêdan para min bû. Me
zarokan barê feqîrtiyê dikişand.
Mezinên me tola cindirman,
tola memûrên Tirkan ji me
derdistan. Sibê ta evarê em
şîvan û golikvanê axa bûn. Me
ev kar jibo qetek nan dikir.

Rojekê ez û bavê xwe çûn
bajêr. Ez hindik mabûm gēj
bibûm. Min bi çavekî mezin li

firoşgehan, li tamefilan û li xaniyên sipî dinerî. Ez û bavê xwe ketin dikanekê. Bavê min ji min re şekirên qulo qulo kirîn. Min bi kulma davête devê xwe. Zimanê min, lêvên min ji wan şekiran sor dibûn. Tâma devê min xweş dibû, av jê dihat. Ger bi a min bûya ê xwediyê dikanê serê min têxista tûrên şekiran û deri li ser min bigirta.

Paşê em çûn dikaneke din. Li vê dikane bi sedan tamefilên piçûk hebûn. Lê bavê min ji min re nekiri. Perên wî nemabûn. Ez giriyam, min xwe

li erdê xist, bu qîj û qîja min, lê feyde nekir. Xalê dikancî jî bi halê min ne di êşiya û xwe kehr dikir.

Ez niha heyjde salî me. Lê ez dîsa jî wê rojê û wê tamefilê jibîr nakim. Min odeya xwe a li Stockholmê bi wan trembêla tijî kiriye. Ez her roj weki zarokan bi wan dilîzim. Jiber ku gava ez zarok bûm a min tûne bû. Ez dixwazim ku vêga zarokiya xwe bijîm û dijîm jî. Kî bi min dikene, bila bikene. Ez dizanim çi hatiye vî serî û hêj jî ê bê . . .



PAŞGOTÎN

Navê Welatê me Kurdistan e.
Bav û kalên me bi hezaran sal
li Kurdistanê jiyane û dijîn.
Çiyayên bilindên bi dar û ber;
deştên fireh û hêşinahî; çemên
geş û bêrdar, bav û kalên me di
zikên xwe de veşartine, wan ji
xwe re xwedî dibinin. Kurdistan
bi her tiştên xwe; bûye mekan,
bûye mal, bûye cih, bûye dad û
welat ji Kurdan re.

Lê Kurdistan iro sito xar e.
Dijminê Kurdan ev dayka me
ya hezar salî ji me sitandine û
xistine bin destên xwe; ew dîl
kirine, ew sêwî kirine: çiyayên
wê xemgir in, çemên wê reben,
deştên wê bê kes . . .

Kurdistan diya Kurdan e. Bi
milyonan ev dayka me zarokan
çê dike û navê wan datine
Kurd. Dayka me Kurdistan
jibo zarokên xwe anji jibo me
pir kişandîye û hêjî dikşîne. Ew
şevitandine, ew dane ber
topan, ew talankirine û dikin
ji . . . Lê dîsa jî dayka me ya
delal û dilsoz, dev ji me

bernade, zarokên xwe navêje
derva.

Kurdistan di şerê yekemîn de
hate perçe kirin. Paşverû,
kolîdar û kevneperestên cihanê
çav berdabûn petrola
Kurdistanê. Kurdistan kirin
çar perçe û di nav: Tirkîyê,
Iran, Irak û Suriyê de par kirin.
Ev her çar welatên faşist,
zorker û kolîdar, bi tanq û
topên xwe, dixwazin ku
Kurdan ji cihanê rakin. Zimanê
me, dîroka me, bi kurtî her
tiştên me hatiye qedexe kirin.
Diya me Kurdistan di nav dest
û peyên wan de maye. Her roj
wê talan dikin, xwûna wê
dimijin, zarokên wê dikujin.


Kurdistan ta sala 1923
welatekî azad bû. Lê piştî
cenga yekemîn Kemal û
faşistên Tirkan bi Ingilîz û
Fîransiya re bûn yek û Kurda
xistin bin destên xwe.

Ji bo wê yekê Şêx Seidê
delal di, 1925 can de li dijî van
kolonyalîstan şer kir. Bi sed

hezaran Kurd hatin kuştin û
 Şêx Seid şehid ket. Piştê
 Şehîdê Mezin, li Dersimê
 Seyîd Riza serê xwe rakir. Tirk
 bi kevnepereştên cihanê re bûn
 yek û ew şoreşa jî vemirandin.
 Lê zarokên Şex Seid, lawên

Seyîd Riza wê şoreşê ê dom
 bikin û dikin jî . . . Ê dîsa
 gulên Feqiyê Teyran geş,
 bexçeyên Seydayê Ehmedî
 Xanî şîn bibin.


Kurd ê bi destên zarokên
 Kurdistan AZAD bibin . . .



Institut kurde de Paris

This is the Kurdish edition of "The Children of Ihsan" which was published in Swedish in 1977. Many children from different countries around the world come to Sweden. When their parents move, the children have to follow. Welat, Zozan and Memo who appear in this book are Kurdish, Sebros is an Assyrian. All of them come from difficult circumstances in Turkey. How are they finding it in their new country?

Mahmut Baksi comes from Kurdistan. He is a journalist and author and has lived in Sweden since 1971. Durali Bozkir is a Turkish artist. He came to Sweden in 1976.



Institut Kurde de Paris



IKPLIV107708

ISBN 91 29 51899 7

Rabén & Sjögren